

# EFP

European Forum for Freedom and Peace  
Foruma Ewropa Ji Bo Azadî û Aştiyê  
Avrupa Özgürlük ve Barış Forumu

**Di Roja Aştiya Navnetewî 1ê Îlonê de**  
**BANG JÎ BO KONFERANSA AŞTÎ û DEMOKRASİYÊ:**  
**EM PÊŞEROJÊ BÎ HEVRE DÎHÛNIN**

*“Di ziman de biratî hebû,*

*di dilê kesî de bi qasî bazkekî cih tune bu ji bo xwe lê deynê”*

*Haydar Ergülen*

Desthilatên ku dixwazin cîhanê ji nûve par bikin û qîrîna azadîxwaziya gelan binpê bikin, hez dikin ramana aştiyê ji rûyê erdê bi tevayî vemalin û bavêjin.

Ji bo bigihên van armancên xwe hevbendiyan ava dikin, dubendiyan diafirînin, li pêşiya mirovahiye keleman diçikînin, qedexeyan datînin û li ser me hemûyan mirinê verdişin.

Weke ku ti ders demexisitibin, ji her du şerên mezîn ên parvekirinê yê emperyalist û ji kuştina bi dehan milyon insanan û ew mîrata mayî ya êşan...

Ji Rojhilata Navîn heta Ewropayê, ji Esiyayê heta Rojhilata Dûr, ji wira jî heta Emerikaya Başûr û Efrîqayê, li qadên şer û pevçûnên ku heye, bê navber yên nuh lê tê zêde kirin.

Her çendin ên nuha di rojevê de Ukrayna, Filistin, Sûriye, Yemen û Kurdistan bin jî, li Meqsiqayê, Ekvadorê, Kolombiyayê, Artsakhê, Sûdanê, Sehraya Rojava, li navbera Hindistan-Pakistan, Uygurê, Tamîr Elamê û Papuaya Rojava bi navber şer û pevçûn rûdide û bi sedan kuştina mirovan dewam dike.

Hîn şer û cengek bi dawî nebû ye yeke din tê tevgêr kirin. Mînak, hîn li Bakurê Kurdistanê şer girantir dewam dike, dewleta tirk, hêza NATOyê jî hildaye pişt xwe û di heman demê de plan û hêrişên xwe yên qirkirinê bê navber li Rojavayê, Başûr û Rojhilat didomîne.


Pêla nijadperest a ku cengê xwedî dike jî, li her erdnîgariyê bi hêz dibe û hêviyên aştî û demokrasiyê dişkîne. Her çendin militarîzm xurt dibe, ewqas jî nijadperestî, homofobî, heteroseksîzm, cinsiyetperestî, dujminatîya koçberiyê û faşîzm jî bilind dibe. Hêzên civakî, rêxistinên polîtîk û kesatiyên siyasî yên li dijî vê tabloya xwînrij radibîn, hema dikevin armancê.

Rêberê Gelê Kurd Ebdullah Ocalan, Rêberê Eniya Rizgariya Gelê Filistin Georges Brahim Ebdullah, ji pêşengê şoreşgerê Gelê Perûyê Elena Iparraguirre Revoredo, Abimael Guzmanê li zînanê jiyana xwe ji dest da, ji rêberê tevgêra Panterên Reşê DYeyê Mumia Abu-Jamal, bi tinê çend rêberên şoreşger ên di salên dirêj de bi zilmê re rûberû man e.

Daxwaza qezenc û mijokdariya xezayê ya bêsinor a hegemonan, cîhanê dajon eko-qirkirinek mezin. Li aliyekî birçibûn û hejarî kûr dibe, li aliyê din bi bazarek mezin a çekan a ku di dîrokê de nehatiye dîtî tê ava kirin re, bi cengan û bi guvaşa avhewa û qeyranên aborî re, arteşek mezin a koçberan sinoran derbas dike û bi milyonan mirov ji xak û welatên xwe dûr dikevin.

Di bin siya şer û cenga avhewa politik a cîhanî de, bi giranî Turkiyeyî û Kurdistanîyên naçarî jiyana diyasporê bûne, di demek nêz de Forma Azadî û Aştî ya Ewropayê avakirin û di serî de li dijî şerên li erdnîgariya xwe û li aliyên cuda yên cîhanê, piştgrî dan xebata aştîyê.

Ne bi tinê di bin bandora şer û cengên Tirkîyeyê û Kurdistanê, cîranê xwe Ewropa Rojhilat(Ukrayna), Kafkasya(Ermenistan-Azerbeycan) û Rojhilata Navîn(Sûriye, Filistin, Yemen) di dimîne, belê di heman demê de ev 40 sale bi doza Kurdan a ku xwedî pir encamên bi xwîn û xirabûnê re serê xwe diêşîne.



# EFFP

European Forum for Freedom and Peace  
Foruma Ewropa Jî Bo Azadî û Aştiyê  
Avrupa Özgürlük ve Barış Forumu

Pêvajoya aşti ya ku di 2013 û 2015an de di navbera rêveberiya Tirkiyê û Tevgêra Azadiya Kurd de hat birêvebirin, ti encam jê nehat girtin û ji aliyê Erdogan ve dawî lêhat anîn. Rêveberiya Tirk dîsa derbasî konseptê şer bû, li dijî Rêberê gelê Kurd Ebdullah Ocalan ê ku ji sala 1999 ve li zîndana Imraliyê rehin hatiye girtin û aliyê sereke yê pêvajoya çareseriyê ye, tecridek giran a dijî mirovahiyê hat despê kirin.

Li dijî rêberê gelê Kurd Ebdullah Ocalan, jiber ku ev ji sê salan zêdetir e tecrîda mitlaq tê meşandin, ne bi tinê ji mafên mirova ve belê ji bo çareseriyê aşti ya doza Kurd jî li pêşiya wî asteng tînan.

Jiber doza Kurd, ku Tirkiye bi girani ketiye çirava militarizmê û nijadperestiyê, lewma ev atmosfera siyasiya wê ya xerab her roj girantir dibe.

Ev avhewa siyasî, di Rojhilata Navîn de binaxa şer û cengê xurt dike, her wiha hêviyên gelan ên demokrasiyê û aştiyek bi rûmet lawaz dixê.

Eha di nava vê tabloya reş de, him li erdnigariya me him jî li hemû cîhanê em, hewcedariyê hin pirtir bi aştiyê, azadiyê, demokrasiyê û diyalogê dibînin.

Em bawer dikin ku em ê karibin bi hev re li dijî cengê, tecrîdê û faşîzmê, bingeha xebatek mayinde ava bikin, em li kêleka hev bi sekinin em ê hîn xurtir karibin ji bo aştiyê, demokrasiyê û azadiyê têbikoşin, hîn pirtir bi rêxistinî û zeminek tekûz bidin rûniştandin.

Ji bo rawestandina şerên li her çar aliyê cîhanê dewam dike, politikayên şer û sûcên şer were teşhîr kirin û derfetên aştiyek bi hev re were guftugo kirin;

Ji bo ku dawî li tecrîda ser Rêzdar Ebdullah Ocalan were û rê û şewazên li pêşiya çareseriyê aşti ya doza Kurdan vebe, bi hev re nîqaş were kirin;

Ji bo li dijî hilwestên hêzên mêtînger û patriarkal, hêviya jiyaneke azad, wekhev û aşti di nav de ya ku jinên Kurd bi banga Jin, Jiyan, Azadî li hemû erdnigariyê bela bike;

Ji bo ava kirina şerd û mercên xebata bi hev re û nêz a bi sazîyên Ewropayê ku bi tîkiliyên diasporaya Tirkiyê û Kurdistanê a li Ewropayê re xurt bike û qada siyaseta nuh were avakirin;

Em bang dikin ji bo beşdarbûna birêxistinîkirina xebata bi rûmet a aştiyek ku hemû mirovahî mîna nan û avê hewcedar e.

Di 1ê Îlonê Roja Aştiya Cîhanê de, em we vedixwînin Konferansa “ji bo Aşti û Demokrasiyê: Em Pêşerojê Bi Hev re Dihûnin”.

Em dibêjin; di dilê cîhanê de, ji bo aşti û biratiyê cih vekin, di 1ê Îlonê de em hev bibînin!

**European Forum for Frêdom and Peace (EFFP)**

**Foruma Ewropa Jî Bo Azadî û Aştiyê**

**Avrupa Özgürlük ve Barış Forumu**

**Dîrok / Dem:** 31 Tebax- 1 Îlon 2024 / 10.00- 18.30

**Navnîşan:** Hermannstrasse/ Rollbergstraße 214-216 / 12049 Berlin

**NOT:** Ji bo guhdarîya wergertina simultane, ji kerema xwe telefonê xwe û berguhka xwe bi xwe re bînin.